

14ê Îlona 2020î

Maskeya rû li Kûyînzlendê (Queensland)

Maskeya rû dikare jibo pêşîlêgirtin li belavbûna Vîrûsa Koronayê (Kovîd-19), nemaze li cihên ku parastina navbera 1.5 metrî ji kesên din dijwar e, alîkar be. Hin mînak ji van deran ev in:

- Girseyên qelebalix
- Malek ku gelek kes têda dijîn
- Li nav utubûsê an li nav trenê.

Di demên jêrê da renga neçar bî li Kûyînzlendê (Queensland) maskeyê daynî:

- Dema derbasbûna nav nexweşxaneyê
- Dema seredana navendeke çavdêriya ji extiyaran li navçeyeke sînordarkirî
- Dema seredana xizmetên îqameta kesên astengdar li navçeyeke sînordarkirî
- Dixtor an perestara te tiştêkî wiha ji te ra gotibe
- Dema ku li bendê yî ku testa KOVÎD-19 bidî.

Girîng e ku berdewam destên xwe bişûyî û bi qasî du pêngavên mezin navbira xwe digel kesên din biparêzî. Hewil bide kesên din hembêz nekî, ranemîsî û destê xwe nedî wan.

Ez çawa maskeyê daynim



1. Beriya danîna maskeyê, destên xwe bi av û sabûnê an şilika dezenfektîrîna destan paqij bike.
2. Zîval an xelekên maskeyê bigire, piştra maskeyê bavêra dora serê xwe an xelean bi guhê xwe va ke.
3. Piştrast be ku maske dev û pozê te bi tamê binûximîne. Piştrast be ku navbera rûyê te û maskeya te tu navbirek tunebe. Heke maaskeya nîştergeriyê bi kar tînî, tîkeya bêvil li derdora bêvila xwe biguvişîne.

Dema bikaranîna maskeyê, destê xwe nede çav, bêvil, dev an beşa pêşîn a maskeyê. Heke te di heyama pêwîst da maske daniye û êdî pêwîstî bi danîna wê nîne, wê derxîne û bavêje nav zibildankê. Heke pêkan e, maskeya xwe li nav kîsikeke dergirtî dayne û bavêje. Derdem piştî avêtina maskeyê li nav zibildankê, destên xwe bişû.

Cûreyên maskeyên rû an nixûmokên din ên rû ên pêşniyarkirî

Baştirîn mnaskeya rû, maskeya niştergeriyê ya yekcarî ye – tu dikarî wê ji dermanxaneyan bikirî. Heke nikarî maskeya niştergeriyê bi dest bînî, bikaranîn aher maskeyeke kaxezî an parçeyî jî guncan e. Maskeyên parçeyî yê herî bibandor herîkêm ji sê layeyan pêk hatine. Heke te nekarî maskeya parçeyî jî bi dest bînî, heta dema ku dikarî dev û bêvila xwe bi durustî û bi destmalê gerdenê an xavikê binixûmîne.

Tu bixwe maskeya ji parçe çêbike

Tu dikarî bi xwe jî maskeya parçeyî çêbikî. Heke tu dixwazî ku baştirîn şêwaza amadekirina maskeya rû bizanî, ji [çavkaniyên bi mifa yê dewleta Australyayê \(PDF\)](#) sûd werbigire.

Şûştina maskeya rû ya parçeyî ya ku dikare dubare were bikaranîn

Maskeyên parçeyî divê piştî her cara bikaranînê bîn şûştin.

Tu dikarî wan li nav Makîneya Cilşok, an bi bikaranîna sabûnê û di germtirîn pileya guncan a avê jibo şûştina parçeyê bişûyî. Maskeya parçeyî beriya bikaranîna dubare li nav zuhakerê kincan an li hewayê azad (li ser benê kincan) zuha bikî.

Piştî destlêdana li maskeyên bikarhatî, destên xwe bi av û sabûnê an şilava dezenfektekirinê bişû.

Hejmara carên guherîna maskeya rû

Nabe ku maskeya niştergeriyê dîsanê bi kar bînî.

Tu dikarî maskeyên parçeyî bişûyî û dîsanê wan bi kar bînî. Fikreke baş e ku herîkêm te du maske hebin ku heke pêwîst bike hertim maskeyeke paqij li ber destê te be.

Dema gerrê an seredana cihekî dûr ji malê, gengaz e ku di hin deman da nekarî navbira 1.5 metro digel kesên din biparêzî û pêwîst e ku maskeyê daynî. Hin deman dikarî navbira xwe biparêzî û hewcetiyeke bi danîna maskeyê tune. Wek mînak heke sibê û dema çûyîna bi cihê xebaata xwe te maske daniye, nabe ku vê maskeyê dema vegeyana bo malê jî daynî.

Maskeyên niştergeriyê yê bikarhatî bavêje nav zibildankê an maskeyên parçeyî yê bikarhatî heta dema ku bikarî wan bişûyî, li nav kîsikeke plastîkî dayne.

Bikaranîna dubare ya maskeya parçeyî bêyî şûşyina wê renge bibe ssebeba veguhezîna KOVÎD-19ê bo kesên din an heta te bixwe, ji ber ku gengaz e cara dawiyê ku te bi kar aniye, hatibe lewitandin. Jibo her mewqiyeye nû, maskeyeke paqij dayne. Maskeyên xwe yê paqij li nav telîseke plastîkî an kaxezî bixwe ra ragire da ku paqij bimînin.

Gelo te hewceî bi lêzanînên pirtir heye?



Heke te hewcetî bi piştgiriya zimanî heye digel 13HEALTH (13 43 25 84) bikeve tşkiliyê û daxwaza wergêr bike. Bêpere ye.

Alîkarî derbarê saxlemiya derûnî

Heke tu derbarê KOVÎD-19ê nîgeranî, tirsiyayî an nerihetî, tu dikarî bi hemjara telefona 1300 MH CALL (1300 64 22 55) bikevî tşkiliyê an telefona Navenda Saxlemiya Derûnî ya Pirrçandî ya Kûyînzlendê (Ji Duşemî heta Îniyê, ji saet 8.30 sibê heta 4.30 berêvar) bi hejmara 189 188 1800 bike. Her wiha heke pêwîst bû dikarî daxwaza wergêr bikî